# Qeydên sûcê ji kesên ku daxwaza xwebexşî û damezirandinê dikin

Di nav rûpela me ya zanyariyan de ‘Destpêkek ji bo vekolîna raboriyê ji bo daxwazkerên damezirandin û xwebexşiyê’ me rave kir ku çima dibe ku rêxistin hewce bike ku berî ku karek an rola xwebexşbûnê pêşkêşî te bike, û li ser Karûbarê Aşkerekirin û Astengkirinê (Disclosure and Barring Service, DBS) ku berpirsyarê kontrolên li Brîtanyayê ne, kontrol bike ka te qeydek sûc heye an na.

Ev rûpel di derbarê kontrol û awayê serlêdanê de agahdariya kûrtir raber dike.

## Kontrolkirinên cuda yên DBS'ê çi ne, û ew çi zanyarîyekê didin?

**‘Belgeyeke bingehîn a DBS'ê’** (Basic DBS certificate) tomarek ji sizayên ciddî û cezayên nîşan dide ku dibe sedema bendkirina domdirêj.

**‘Belgeyeke standard a DBS'ê’** (Standard DBS certificate) tomarek ji sizayên ciddî an tu cezayeke têkildar nîşan dide. Hin cezayên bihûrî di bin yasa ya Brîtanyayê nayê belavkirin, heke ku wî kes bihête dîtin wekî ku di derveyî serdema rehabîlîtasyonêde hatîye naskirin.

**‘Belgeyeke bêtirkirî ya DBS'ê’** (Enhanced DBS certificate) heman agahî wek belgeyekê nîşan dideherwisa herwisa agahîya tomarên din ku karmenda polîs ê têkildar bizane.

**Sertîfîkaya DBS'ê ya 'bi navnîşên astengkirî yên zêdekirî'** (Enhanced with barred lists DBS certificate) dê wek kontrolkirina zêdekirî nîşan bide û dê her tomareke kesane di lîsteyeke qedexekirî de jî nîşan bide. Lîsteya qedexekirî lîsteyek e ku DBS hildigire ji kesên ku zirar bigihînin an dibe ku zirar bigehînin komên xizan.

Tomarên ku têne kontrolkirin her tomarên heyî yên ku di derheqê te de li ser Komputera Neteweyî ya Polîsê têne hilgirtingirtin in, di nav de zanyarîyên ku ji Înterpol (Navdewletî), Komeleya Serfermandarên Polîsê Ofîsa Qeydên Tawanan (Association of Chief Police Officers Criminal Records Office, ACRO), û ji welatên ku Brîtanya bi wan re lihevhatina parvekirina zanyarîyê heye.

Heke ku kesek tomara cezayî ji bo hin tiştan hebe ku weke ceza di Brîtanya nayê hesibandin, ev li ser belgeyek nayê aşkirakirin.

## Ez çawa daxwaza kontrolkirineke DBS'ê bikim?

1) Ji bo kontrolkirina seretayî bi xwe bi awayê online daxwaz bike ji bo DBS'ê, an destûr bide rêxistinekê ku serlêdana te hêsan bike. Ji bo cureyên din ên kontrolkirina DBS'ê, sazîya damezirandinê formeke serlêdan bote dişîne. Ev form dibe ku bo sazîya damezirîner were pêşkêşkirin, an sazîyeke pispor ku hatîye rêpêdan ji bo kontrolirina “birêvebirin”.
2) Vê formê bi tevahî tîjî bike, zanyarî derbarê xwe bide, li ku jiyayî, û her qeydên sûc û cezayê yên din ku divê ku tu belav bikî. Ev form ji te dixwaze ku formet û roja Brîtanyayê bi kar bînî û hin peyvên teknîkî bi kar tîne ku heye ku tu bi wan re rehet nebî. Şaşitiyên ser wî formî

dikare bibe sedema derengketinê, bi wî rengî ev dikare alîkarî bike ku kesek ji bo emînkirinê hebe ku di tîjîkirina wî forma piştevanîya te bike.
Ev form ji te dixwaze ku navnîşan ji bo pênc salên dawîn pêşkêş bikî.
Heke ku te demeke dirêj ya gerîn heye ku têkilar bi daxwaza penaberiyê nîne, tu dikarî binivîsînî 'abroad' (derveyî welat) û welat û rojê wê jî binivîsînî. Heke ku tu di derveyî welat jiyabî, hewce dike ku di xeta yekem ya navnîşana bihûrî ya xwe binivîsînî 'overseas' (Derveyî welat), û piştî wî welat û rojên di xanîya pêşkêşkirî de binivîsînî.
Heke ku te demeke bêmalbûn hebe, an çûyî cih an kempan di rêwîtiya xwe de û li dû penaberiyê bûyî, nabe tu navnîşanek ji bo wê demê pêşkêş bikî. Tû dikarî binivîsînî 'no fixed abode' (Bêyî cihê hertimî) 'abroad' (li derve), an 'no fixed abode – UK' (Bêyî cihê hertimî – Brîtanya), û rojên ku ev rewşa te bû binivîsî. Heke ku tu bi koletiya nû (bazirganî), binçavkirina koçberiyê an jî rewşên din ên ku di formê de bilêvkirina wan dijwar be, rûbirû bûyî, dibe alîkar ku bi xeta alîkariyê ya DBS'ê re têkilî bikî da ku şîret bixwazî berî ku forma xwe pêşkêş bikî.

Agahî: Heke ku tu di binçavkirina koçberî de bûyî û ev mijar ne bi tawanek îdiakirî an dozkirî ve girêdayî bû, ev ne tomareke sûc e û ne hewce ye ku wê eşkere bikî.

3) Pêdivî ye ku piştrastkirina navnasa xwe nîşan bidî bi pêşkêşkirina belgeyên eslî ji lîsteya pesendkirî ya DBS'ê. Heke ku nekarî vî karî bikî, ev bijardeyek ji bo te ku bibêjî dixwazî li dewsa wê şopa têliyan pêşkêş bikî.
Heke ku dibêjî ku bi pêşkêşkirina şopa têliyan an jî pencemorê kêfxweş î ji bo armanca kontrolkirinê, proseyeke îdarî heye ku ku tê de rêxistina damezirandin ji DBS'ê re dibêje ku tu yê pencemorê bişînî û piştî vê yekê bi postê piştrast bikî. DBS digel polîsê xwecihî danûstandin dike ku piştre te vedixwînin ku şopa tiliyên te were girtin (ev daxwazname dikare bi rêya name an telefona polîs be). Ev pêvajo dibe ku hin dem bibe.
Girîng e bizanî tevî pevçûna te digel polîs, tu ne di bin gumanê de yî. Bi wî sedemê ye ku efserên perwerdekirî hewce ne ku vê pêvajoyê bi rengek ku nasname û tomarên te diparêze temam bikin. Tu danûstandin digel polîs dikî wek kesek ku dixwaze bi rêya karkirin û xwebexşî beşdarî bike, û tu hewce dike ku têkilîyeke erênî tecrûbe bikî. Heke ku tu ji aliyê pratîkî an jî hestyarî ve zehmet dibînî ku biçî navenda polîs ji bo te ku pencemora te bigirin, an jî ji bo sserdana roja hevdîtinê dikarî vê yekê bibêjî û bipirsî ka alternatîfek mimkin e an na. Herwisa dikarî kesekî bi xwe re bibî.
4) Piştî ku ev form were pêşkêşkirin û navnasa te hate piştrastkirin, xizmata DBS'ê vê zanyarîya pêşkêşkirî bi kar dîne ji bo te ku tomarên polîs kontrol bike di bin rêzîka qanûnî ya ciddî. Ew li agahîyên berdest dinêrin û rêbazeke qanûnî derbarê ev tiştek ku dibe bihête eşkerekirin dissepînin û belgeyek çap dikin ku eşkere bike ev tiştên ku ji bo wê rolê têkildar e ku daxwaz dikî, nîşan dide. Ev belge bo te tê şandin.

Damezirînera te belgenameyê li ser daxwazê dibîne; tu neçar nînî ku vê belgeyê di vê gavê de nîşan bikî, lê heke vî kaarî nekî, ew ê nekarin te damezirînin Heke ku birêvebera damezirandinê dixwaze ku derbarêher cure zanyarîyekê li ser belgeya te bi te re biaxive, ev baş e ku bipirsî ku ev di cihekî de rû bide û valahîyek ku ji bo te guncandî ye. Heke ku tu şîret bixwazî berî civînekê, an bixwazî ku keseke bawerkirî ji bo piştevanîyêdigel xwe bînî, bi taybet heke ku te astengên ziman an çandî hebin, dikarî vî karî bikî.

5) Tomarkirinê berçav bigire digel Xizmeta Nûkirina DBS'ê. Ev yek sertîfîkaya DBS'ê ya te nû dike û rê dide damezinînerên dahatî ku belgeya te kontrol bikin. Heke ku daxwaza roleke nû dikî ku hewceya heman asta kontrolê dike, damezirîner dikare kontrol bike bi rêya sîstema

nûkirinê, ne ku daxwaz ji te bike ku dîsa li hemî pêvajoyê binêrî. Tu dikarî di demeke nêzik de derdem digel daxwaza hejmara xwe ya DBS'ê û heya 30 rojan piştî ev roj ku belge tête derxstin tev bigerî  (ev ji bo kontrola bingehîn neberdest e).

### Alîkarî bi DBS'ê

Tû dikarî alîkarî werbigirî bi têkilîkirin bi xeta pirskirina DBS'ê (customerservices@dbs.gov.uk 03000 200 190) heke ku

- Heke te her cure nîgeranî derbarê her tiştê ku di belgeya xwe de tê nivîsandin hebe
- heke tu nezanî ku pirsek têkildar bi te ye an na
- an jî te belgeyeke pênbaseyê hebe ku di lîsteya piştrastkirî de nebe
- an pirseke te ya din di dema vekolandina DBS'ê hebe

Heke ku trans-zayendî bî û nekarî zanyarî navnasa berî ya xwe bi dameziriner re bidî, wê gavê tu dikarî têkilî bikî  bi Tîma Serlêdanên Trans-zayendî ya DBS'ê re.

### Mesele û Nîgeranî

### Meseleyên têkildarî kontrolên navneteweyî

Heke ku tu nekarî mercên dameziriner ji bo sertîfîkaya tevgeriyana baş li derveyî welat dabîn bikî, tu dikarî daxwaza awarteyek miafbûnê bikî. Ev tê vê wateyê ku dameziriner li zanyariyên din dinêre da ku ji bo pêşniyarkirina rolê bo te piştrasttir bibe. Dibe ku ew nirxandina metirsî bi cih bînin, dest ragiuhêjin jêder û çavklaniyên zêdetir, rolê biguherînin , ji te bixwazin ku xwe-aşkirakirinê îmze bikî an jî sond bixwî.

Xwe-vegotin pêk tê ji daxuyanîyeke nivîskî ya îmzekirî derbarê vê yekê ku tomarên sûcdar tunene, an parvekirina tomareke sûcê te heye ku bi qanûnî pêdivî ye ku were eşkerekirin.

Sondxwarin jî weke wê ye,  lê ev daxuyanî ji aliyê parêzerekî an "Komîsyona Sondxwaarinê" ya tomarbûyî li Yekîtiya Ewropayê ve tê morkirin û piştrastkirin. Haya piranîya damezirînerên Ji van îhtimal û îmkanan tune.

### Heke te ji bo daxwaza online pirsgirêk hebe

Heke te  ji bo daxwaza temamkirina online ya DBS'ê pirsgirêk hebe û nekarî daxwaza xwe bi cih bikî, bi sedema pirsgirêka xwe digel raboriya navnîşana xwe an çimkû tu nekarî belgeya karaktera baş pêşkêş bikî, daxwaza alîkarî bike. damezirînerTu dikarî nîgeraniya xwe digel rêxistina ku vekolandina DBS'ê pêk tîne re parve bikî an ji DBS'ê, damezirînera xwe, karekeî bingehîn an parêzerekî daxwaza piştevaniyê bikî.  Carna ev pirsgirêk li encama dîzayna pirsgiran di cûrên ku sîstemên elektronîkî hatibe çêkirin rû didin, an bi sedema ev ku ew sîstem hewce dike ku cihên tomar bikî ku bi rewşeke taybet ya din bin. Ev pirsgirêk bi giştî dikarin bên çareserkirin.

### Heke te raboriya sûc hebe

Heke te raboriya sûcê hebe Unlock enstîtûyeke xêrxwaziyê ya serbixwe ye ku zanyariyên pêbwer û xizmetên şêwirînê ji bo kesên bi raboriya sûc û cezayê pêşkêş dike. Ew her wisa dikarin şêwirîn û piştevaniya serbixwe û bêalî bo karssaz û pisporên çavkaniyên mirovî (HR) ku li ser bingeha zanyariyên raboriya cezayê biryar didin, pêşkêş bikin.

Ev belgeya agahîyê ji alîyê Migration Yorkshire (Koçberîya Yorşeyr) di Çileya 2022an de hatîye nivîsandin. Heke pirseke te heye ji kerema xwe bi me re peywwendî dayne û em ê hemî hewla xwe bi kar bînin ku alîkarî bidin te: admin@migrationyorkshire.org.uk an 0113 378 8188